6. Kimyasal silahlarla savunmasız halkın katledilmesi, köylerin ve ekinlerin yakılması, yağmalanması; küçük çaplı savaşlar, açlığa, işsizliğe ve hastalıklara neden olmuştur. Halk ağır ağır fakat sistemli bir biçimde yok ediliyor. Saddam tam bir halk katliamı uygulamaktadır. Bu katliam 9 Aralık 1946'da imzalanan Cenevre antlaşmasına aykırıdır. Bu nedenle Irak rejimi yargılanmalı ve cezalandırılmalıdır. Özellikle Cenevre antlaşmasında belirtilen bir halk, ayrı ulusal değerlere sahip olması ya da ayrı bir dine sahip olması ya da başka nedenlerle katledilemez, ayırım yapılamaz ilkesine aykırıdır. Cenevre antlaşmasının 3. ve 4. maddeleri Baas rejiminin uygulamalarını bütününü ile mahkum etmektedir. Çünkü bu uygulamalar insanlığa karşıdır. Bütün BM protokollerine karşıdır.

İnsanlığa karşı olan bu

ACİL ÇAĞRI

Mesud BARZANÎ

suçlar, Irak Kürdistanı'nda yaşayan bütün insanlara, ve bir halka karşı işlenmektedir.

7. Bu insanlık dışı uygulamaların kavranması için aşağıda kısa bir istatistik vermeyi yararlı görüyoruz. Bu istatistik Irak rejiminin çizdiği alanlara göre saptanmıştır.

A) % 100 yerlebir edilen alanlar:

Süleymaniye...3546 km²
Erbil-Hewler...2899 km²
Kerkük.....3830 km²
Dıhok.....4122 km²
TOPLAM.....13650 km²

B) % 50 yıkılan bölgeler

Süleymaniye...2684 km²
Erbil.....4349 km²
Salahaddin.....1450 km²
Musul-Dıhok...1304 km²
TOPLAM.....9787 km²

C) Boşaltmak ve yıkmak için resmi tebliğ verilen bölgeler:

Erbil.....4560 km²
Diala.....2200 km²
(Haneqin bu bölgeye bağlandı)

Bunlar dışında Süleymaniye ve Dıhok'un tümü yıkılıp boşaltılmak isteniyor. Kişisel görüşüm şudur ki, Saddam rejimi bütün Kürdistan'ı yakıp yıkmak istiyor. Saygıdeğer arkadaşlar;

Ezilen ve baskı altında tutulan Kürt halkı adına, kurtarılmış alanlara sığınan onbinlerce aile adına, açlık, korku ve hastalık içinde kıvranan Kürt çocukları adına, toprağını ve köyünü kaybeden emekçi köylüler ve Kürt anaları adına, okuma olanakları ellerinden alınan Kürt öğrencileri adına sizden rica ediyorum;

1-Kara günler içinde yaşayan halkımızla dayanışma gösterin.

2-İrak rejiminin uygulamalarının durdurulabilmesi için, resmi tüm imkanları seferber edin.

3-Yetkili kurumların insanları Kürdistan'a gelsin. Kurtarılmış alanlarda ya da diğer alanlarda bulunan aç, susuz ve fakir insanların durumunu kendi gözleriyle görsün. Ekonomik zararı ve yıkılan yağmalanan köyleri görsün.

4-Yardım elinizi, yoksulluk ve terör içinde bulunan bu mazlum halka uzatın.

Saygılarımla
5.5.1987

(Yukarıdaki metin M. Barzani tarafından 5 Mayıs ta kaleme alınmış, 25 Mayıs tarihinde Kürdistan Press'e ulaştırılmıştır)

HEFTA ÇUYÎ LI KURDISTANA ÎRAN

Berpîrsiyarên buroya nasandina welatên der yên KOMELA, Muhamed Sadîk û Kamangar Sadîk ji Parîs didin zanîn.

Li gor nûçeyên teleksa, ku di 25.5.1987 an de ji Ajansa Nûçeya Kurd re hat şerê dijwar navbera Komela û pasdarên Îranê berde-wam dike.

Ji 14 Gulana heta 20ê Gulana, pêşmergekên girêdayî Komela, li *Baneh*, *Sakîz*, *Devan-Dareh* û *Sanandaj* çalakiyên leşkerî pêk anîn.

Di 14ê Gulana de li gundê Hasanabad, ku 6 km. dûrî Sanandaj e, operasyonê leşkerî li dijî leşkerên Îran pêk hat.

Di 15 Gulana de, li ser rîya bejî a Saqîz-



Sanandaj, ku 2 km. dûrî Saqîz e, çalakiyek li dijî qeraqola cendarmîk pêk hat. Di eynî rojê de, mufrezek pêşmergek êrişî dewriya leşkerên Îran kirin û ew ji holê winda kirin.

Di 16ê Gulana de pêşmergek operasyonê leşkerî li dijî bingeha leşkerî a, ku 2 km. dûrî Devan-Dareh e, kirin.

Di 17ê Gulana de li ser rîya Sanandaj-Saqîz hêzên rejîmê êrişî hêzên pêşmergek kirin. Di navbera wan de lihevketinên dijwar çêbûn.

Di 20ê Gulana de, li nêzikê bajarê Baneh, li gundê Kandah-Sorehê operasyonê li dijî hêzên Îranê li dar ket.

Di eynî rojê de ji bo bersiva vî operasyonê êrişek dij li dar ket. Li gundê Sairan-Bandê, nêzikê Banşê di navbera hêzên pêşmerge û hêzên leşkerên Îranê de şerek dijwar çêbû.

Di encama çalakiyên de 100 leşkerên Îran hatin kuştin, gelek birindar û hêsir jî bi dest ketin.

Di 25ê Gulana de, hêzên Pasdar, ku ji 50 kesî pêkhatî bû, îcar êrişê herêma pêşmergek - Saqîz-Baneh- kirin.

Di lihevketina, ku rîya Gardeneh-Han de çêbû, hêzên rejîmê ji taqat hatin xistin û êriş şikest. Mufreza leşkerî bi carekê hat winda kirin, hinek jî wan jî hêsir hatin girtin.

Di nav cendekên mirî de, cendekê berpîrsiyarê leşkerî Karîm Cafer jî hebû.

Ev rîya, ku di navbera Saqîz-baneh de ye, di Kurdistanana Îranê de xwediyê giringiyek stratejîk e.

Di encama êrişê de mufreza bi tevayî hat winda kirin, gelek hecet pêwestî û tiştên giring bi dest ketin.

ÎRAN KÛRDÎSTANÎ'NDA GEÇTÎGÎMÎZ HAFTA

Komela Dîş Ûlkeler Tanıtma Bürosu sorumlularından Muhamed Sadîk ve Kamangar Sadîk Paris'ten bildiriyor;

25 Mayıs 1987 tarihinde Kürt Haber Ajansı telexine ulaşan haberlere göre, Komela'ya bağlı peşmerge kuvvetleri ile İran pasdarları arasında son hafta içinde kesintisiz çatışmaların olduğu bildirilmektedir.

14-20 Mayıs tarihleri arasında Komela örgütüne bağlı peşmerge güçleri Baneh, Sakîz, Devan-Dareh ve Sanandaj bölgelerinde seri eylemler düzenlediler.

14 Mayıs günü Sanandaj iline 6 km. uzaklıkta bulunan Abad köyündeki İran askerlerine karşı bir operasyon düzenlendi.

Bir gün sonra, 15 Mayıs'ta bu kez Sakîz-Sanandaj karayolu üzerinde bulunan ve Sakîz'dan 2 km. uzaklıktaki jandarma karakoluna karşı askerî bir eylem düzenlendi. Aynı gün bölgede devriye olarak dolaşan pasdarlara karşı yapılan başka bir operasyonda ise bütün devriye imha edildi.

16 Mayıs tarihinde, Devan-Dareh ilinden 2 km. uzaklıkta bulunan askerî bir merkez peşmerge kuvvetleri tarafından saldırıldı. Saldırının artması sonucu, Sanandaj-Sakîz karayolunda ve Sanandaj'dan 2 km. uzaklıkta bulunan peşmerge

güçlerine karşı İran pasdarlarının 17 Mayıs'ta düzenledikleri saldırıda şiddetli çarpışmalar meydana geldi.

20 Mayıs'ta Komela birlikleri, pasdarların askerî üs olarak kullandıkları ve Baneh ilinin yakınlarında bulunan Kandah ve Soreh köylerine saldırıldı. Aynı gün İran askerleri, bu operasyona cevap vermek amacıyla karşı saldırı düzenlediler. Banş bölgesinin batısında bulunan Siran ve Band köyünde peşmerge kuvvetleri ile pasdarlar arasında şiddetli çarpışmalar meydana geldi.

Bu eylemler sonucu 100 İran askerî öldürülürken çok sayıda yaralının esir edildi.

25 Mayıs günü pasdar birlikleri 50 kişiden oluşan bir güçle, Komela peşmergeklerinin bulunduğu Sakîz ve Baneh karayolundaki bölgeye saldırıldı. Baneh şehrinin 5 km. uzaklıkta bulunan Gardeneh-Han yolundaki çatışmalarda ise, İran kuvvetleri etkisiz hale getirilerek askerî birliklerin büyük bir kesimi yok edildi ve bir kısmı da esir alındı. Çatışmada, İran Pasdar Askerî Birlikler sorumlularından Kerîm Cafer de öldürüldü.

Sakîz-Baneh arasında bulunan bu yol İran Kürdistanı'na ulaşımda stratejik bir öneme sahip.

Çatışmada peşmergekler çok sayıda araç gereç ve cephane ele geçirdiler.

□

Seminerek li ser kiryarên rejîma Irak

ANK • Stockholm

Di roja 30.5.87'an de li Swêd bajarê Stockholm hêzên Kurdistanana başûr li ser kiryarên rejîma BAAS seminerek pêkanin.

Seminer ji aliye rexistinên PDK-I, YNK, PSK-I, PA-SOK û PDGK, ku bi navê komîta karê hevbaş hat pêşkêşkirin.

Di semirê de li ser bikaranîna çekên kimyevî û koçbarî ya (sîrgun) tevayî hat rawestîn. Di seminerê de hate gotin ku "...ji sala 1975 an heta niha 2279 gund hatine wêran kirin. Di navbera salên 75 heta sala 87 meha 4 an li Kurdistanê nazîkî 40585 km² hatîye şewitandin û wêrankirin. Rejîma Iraqê piştî 10.4.87 an jî dixwaze 6.760km² vala bike, ji ber vî li ser wan navçan çekên kimyevî bikartîne."

□

LI KURDISTANA BAŞÛR 8 Kurd hatin darvekirin!

ANK • Kurdistan

Ji bo şikendina berxwedana geleri li bajar û gundan rejîma BAAS ji bo çavtirsandîna wî jî bo perçiqandina vî berxwedanê li hember gelê me yê bê parastinê êrişên xwe zêdetir dike. BAAS vî carê li Silêmaniyê jî bo çavtirsandina gelê me, 8 Kurd darvekirin.

Di roja 13.5.1987 an de di nav bajarê Silêmaniyê de ber çavên xelkê 8 merivên bê guneh hatin kuştin. Di roja 20.5.1987 an de Partiya Sosyalîsta Kurdistan-Îraq, daxuyaniyek bi navê kuştîyan ji Al re rêkir. Di vî daxuyaniyê de protestokirina dewleta Iraq hate xwestin. Navên kesên ku darvekirin ev in: *Salih Ebdilla, ji gundê Vabiskul - Haci Resul Mam Ehmed, ji Sergelu - Reşid Emîn, ji Gozîne - Eta Xemê Emîn, ji Sirwan - Cemal Malomî, ji Malume - Cemal Mistefa, ji Sergelo - Hoşeng Ebdilhemîd Goran, ji Heldin - Şerîf Hesen, ji gundê Mawlan.*

YEKEMÎN KOMELA KURDÎ

"KURDISTAN AZMÎ QAWÎ CEMİYETİ" (1)

1900 - İstanbul

□ Ev cemiyet yekemîn organizasyona kurdî ye ku heta nuha tê zanîn û di 1900'î de li İstanbulê hatiye damezrandin.

Wê demê İstanbul paytextê Împaratoriya Osmanîyan bû, her weha di nabêna Rojava û Rojhelatê di wek pîrekê bû ku ji ber wê yekê jî merkezeke kulturî û siyasî bû.

Piranîya ronakbîr û xwendevanên milletên ku di bin hakimiyeta Osmanîyan de bûn, li vî bajarî kar û barên xwe yê siyasî û kulturî dimeşandin. Li gor şert û şîrûtên wê demê komele û cemiyetên resmî dadimezrandin. Piranîya xebatên xwe yê siyasî û kulturî bi wasita van komele û cemiyetan çêdikirin, birêve dibirin, kovar, rojname, kitab û hwd. derxistin, belav dikirin.

Bê guman wê demê piranîya ronakbîr û xwendevanên kurda jî bi her awayî kar û barên xwe yê siyasî û kulturî li İstanbulê dimeşandin. (2) Di ronakbîr û xwendevanên kurda mebest ev e; zarokên axa û dewlemendên kurda ku ji bo xwendinê hatine İstanbulê û malbatên mezin û hin eşrafên kurda û zarokên wan ku li İstanbulê bicîh bûbûn û her weha hin malbatên mezinên Kurd ên ku bi zora Osmanîyan li İstanbulê hatibûn bicîh kirin. Ji ber ku di wexta xwe de mezin û giregirên van malbatan li dijî padişahên Osmanîyan rabûne, an jî ji bo damezrandina Kurdistanê li dijî Osmanîyan şer kirine. Her wekî kesên ji malbata Şêx Ubeydullahê Nerîyê Şemzînanî û yê Bedirxan Begê Mirê Botan. Dîsa li derveyî van kesan li İstanbulê gelek Kurdên din jî hebûne ku piraniya wan karkirî, rênçberî, an jî dergevanî û hemalî dikirin.

Ji van ronakbîrên kurda hinekên wan her di wê wextê de bi navê "Kurdistan Azmî Qawî Cemiyeti" yê komeleyekê dadimezrandin ku ev komele yekemîn organizasyona Kurdî ye(3) heta nuha em pê dizanin.

Derheqê vî cemiyetê; "Kurdistan Azmî Qawî Cemiyeti" de piştî tiştên nayê zanîn. Damezrandina wê, muesîsîsên wê, cemiyet çiqas jiyayê, fealiyetên wê çî bûn? Bersiva van pirsana hemû nuka ji bo me di tariyê de ne, baş nayên zanîn û tû malûmatên tekûz jî di destê me de tuneye. Tenê ya ku tê zanîn "Kurdistan Azmî Qawî Cemiyeti" di 1900'î de li İstanbulê hatiye damezrandin. Fikrî Efendiye Diyarbekirî jî yek ji muessîsên wê bûye. (4) Ji endamên vî cemiyetê jî tenê navê du kesan diyar e ku ew jî ev in:

1) Kurdîzade Ahmed Ramîzê Licê-yî (5), (6)

Kurdîzade Ahmed Ramîz jî piştî de di 1904'an de ji hukma Osmanîyan mecbûr dimîne iltîcayî Misirê dîke. Demekê li wê derê dimîne. Ew li Misirê jî di paralêla vî cemiyetê (Kurdistan Azmî Qawî Cemiyeti) de kar û xebat xwe didomîne. (7) Piştî îlana Meşrûtiyetê vedigere İstanbulê, li İstanbulê jî her di kar û barên kulturî û siyasî ya kurda de di-

xebite. (8)

2) Ehmedê Xasî (Melayê Xasî) (9) Ehmedê Xasî di 1863 (?) an de li Hezanê(10) jî dayik buye ku xwediyê Mewluda Zazakî (Dimilî) ye. Ev mewluda wî di 1899'an de li Diyarbekirê hatiye çapkirin. Ehmedê Xasî jî ber ku xebata kurdîtiyê dike, Sultan Ebdulhêmîd wî surgûnî (nefi) Rodosê(11) dike. Ehmedê Xasî şeş mehan li Rodosê dimîne. (12)

"Kurdistan Azmî Qawî Cemiyeti" çî wext hatiye girtin, ev yeka jî ji bo me ne ronî ye. Tenê tiştê heye ku ew jî 1904; yanê tarîxa iltîcakarîna Kurdîzade Ahmed Ramîz e ku iltîcayî Misirê kiribû. Mumkune ku cemiyet jî her di wê tarîxê de (1904) jî alî Sultan Ebdulhêmîd ve hatiye girtin. Her weha nivîskar Mehmet Emîn Bozarşan jî derheqê girtina vî cemiyetê de wek tarîx 1904 nivîsiye. (13)

Wekî me li jorê jî got; derheqê fealiyetên vî komele de jî tu malûmatên berbiçav nînin, tenê ya ku tê zanîn; li ser kitêba "Emîr Bedirxan" ku naşirê wê (yê ku neşir kirîye) Lütfî ye, hatiye nivîsin ku "Hasilati Kurdistan Azmî Qawî Cemiyetine ait" (Kara wê jî Kurdistan Azmî Qawî Cemiyeti'yê re ye). Ev kitab jî bi xwe di matbaa "İctihad" a Dr. Abdullah Cevdat de hatiye çapkirin. Ev Lütfî jî mumkune ku Dr. Abdullah Cevdet bi xwe be. (14)

Tiştê herî muhîm û balkêş ew e ku her di wê demê de rojname "Kurdistan" (1898-1902) jî tê weşandin (cara pêşîn ji alî Miqdad Mîdhet Bedirxan ve di 1898'an de li Qahirê hat derxistin) lê di nav rûpelên tu hejmareke "Kurdistan"ê de qala vî cemiyetê nayê kirin, çî jî alî nivîs û çî jî xeberek. (15)

Ji vî yekê welê tê fêhm kirin ku tu peywendî û têkilîyek di nabêna "Kurdistan Azmî Qawî Cemiyeti" û rojname "Kurdistan"ê de çê nebûye. Ger bibe jî ev yeka rojname de nehatiye diyar kirin.

Mahmûd LEWENDÎ

(1) Di ma'na "Komela Irada Bihêz a Kurdistanê" de ye.
(2) Bê guman wê demê li derveyî İstanbulê, li Kurdistanê jî fealiyetên siyasî yê kurda hebû, lê piştî re de diyar bibe ku bi taybetî kar û xebatên kulturî û siyasî û komele bi tevayî li İstanbulê tê meşandin.
(3) Di vî bareyê de li derveyî Zînnar Silopî, M. Emin Bozarşan û Malmîsanîj, piraniya tarîxzan û lêkolînerên kurda dînivîsîn ku komele kurda a pêşîn "Kurd Teavûn we Teraqî Cemiyeti" ye (1908)
(4)-(5) Zînnar Silopî; *Doza Kurdistan, 1696, Lubnan (?)*, Stewr Basîmêvî, r:25-26
(6) Licê; *geziyeke Diyarbekirê ye.*
(7) Silopî; *her eynî cavanî*, r:26
(8) Malmîsanîj; *Yûzylumz Başlarında Kürt Milliyetçiliği ve Dr. Abdullah Cevdet; 1986, Uppsala (Swêd), Weşanên Jina Nû, r:44-50*
(9) "Hevpeyvîn Bî Malmîsanîj Re"; rojname Armanç, no: 63 (1986, r:8 Stockholm)
(10) Hezan; *Li hêla Diyarbekirê nahîyeyek e ku bi qeza Licê ve girêdayiyê.*
(11) Rodos; *giravê e li Derya Sîpî.*
(12) Malmîsanîj; "Nimûneyê Edebiyatê Dimilkîyê Klasiç û Dînî, Mewlûda Nebî"; Hêvî; *Kovara Candiya Giştî*, no:4 (11on 1985), Paris, r:75-76 (ji nota binî)
(13) M. Emin Bozarşan; *Jin (Kürtçe-Türkçe Dergi 1918-1919)*, Uppsala, 1985, cild:1, r:24 (ji pîşgotinê)
(14) Malmîsanîj; *Yûzylumz Başlarında Kürt Milliyetçiliği ve Dr. Abdullah Cevdet*, r:28
(15) Binêre rojname "Kurdistan", no:1-31 (1898-1902).

Peşmerge Kürdistan'ı adım adım kurtarıyor!

□ 13.5.1987'den 21.05 tarihleri arasında, Seidsadiq, Helebçe, Sirwan, Xurmal, Şanederi ve Elbet bölgelerinde aralıksız çarpışmalar oldu. Direniş, bölge halkı ve peşmerge desteğinde devam ediyor. IKDP ve YNK'ye bağlı peşmerge birlikleri bu mıntikalardaki direnişin kırılmaması için köy halkıyla birlikte aktif direnişi örgütlüyor. Aralıksız süren çatışmalar sonucu Sirwan ve Xurmal kurtarıldı. Kazanılan zafer nedeniyle, Irak güçlerine yardım eden bu bölgedeki caşların tümü silahları ile birlikte peşmerge saflarına katılırken, deliye dönen rejim birlikleri, direnişi kırmak amacıyla bölgeyi baştan başa bombaladı. Zarar ile ilgili net bir bilgi henüz elimize ulaşmamakla birlikte, zararın çok yüksek olduğu bildiriliyor.

Öte yandan bu bölgelerde peşmerge güçlerinin eline yüksek miktarda askeri araç ve mühimmat geçti. YNK ve I-KDP'ye bağlı güçler tam bir ittifak halinde bölgedeki çalışmalara devam ediyorlar.

□ Süleymaniye şehir merkezinden bölgeye yapılabilecek yardımları engellemek amacıyla, Baas rejimi tüm şehirde sokağa çıkma yasağı koydu. Rejim güçleri, sokağa çıkmayı ve yakın köylere yardımı engellemeye çalışmasına rağmen, şehir halkı sürekli olarak köylere yardım iletiyor.

□ Süleymaniye ve Erbil illerine Kürdistan'ın Sesi Radyosu aralıksız yayın yapmakta ve halkı direnişi çağırılmaktadır. Radyo yayınlarında geniş informatif bilgiler verilmekte ve Avrupa'da ki protesto faaliyetleri geniş bir biçimde duyurulmaktadır. Yayın özellikle Hewler, Süleymaniye, Musul ve Dihok illerine bağlı köylere yönelik yapılıyor. Öte yandan bölgede mücadele eden ulusal güçler arasındaki tam bir dayanışma ve ittifak, savunmasız sivil halkın peşmerge saflarında direnişe katılmasına neden olmakta ve yüksek bir moral sağlamakta.

□ 20.4.1987'den, 5.5.1987'e kadar, 15 günlük süre içinde I-KDP peşmergeleri verilen istatistiklere göre 22 askeri eylem yaptı. Bu askeri eylemlerin 28'ini CUD güçleri ile planlarken, 4 tanesi YNK ile birlikte düzenlendi. Bu 122 eylem sonucunu şöyle özetlemek mümkün;

□ 12 stratejik öneme sahip askeri karargah ele geçirildi.

rek, kullanılmaz hale getirildi.

□ Stratejik önemi büyük Kanimesi karargahı ele geçti.

□ Karadağ dışediş bir mücadele sonucu kurtarıldı.

□ Düşman, aralarında yüksek rütbeli subayların da bulunduğu 291 ölü verdi. Bunlar içinde 14 tanesi ölü olarak peşmergenin eline geçti. Aralarında 8 Albay, 1 Hava albayı ve 1 piyade albayı var.

□ Eylemler sonucu 600 Irak askeri ve caş, ki bunlardan 412 tanesi silahları ile birlikte Dihok'un Dereluk nahiyesine bağlı Kani mıntikasında peşmerge güçlerine katıldı. Bunlar arasında yüksek rütbeli iki caş komutanı var; **Abdülvahit Nerweyi ve Selim Çeyi**.

□ 15 günlük eylem sonucu düşman güçleri yüzlerce yaralı vermiş ve 137'si yaralı olmak üzere, 259 asker peşmerge tarafından esir edilmiştir.

□ I-KDP ve CUD'a bağlı peşmerge birlikleri, Kanimesi-Zaxo, Bamerne-Sersing ve Dereluk-Amede arasında bulunan anakarayollarında tam bir denetim sağlamış bulunmaktadır. Rejim için hayati öneme sahip bu karayolları, peşmergenin denetiminde olması nedeniyle bölgedeki tüm iletişim durdurulmuş, bu nedenle çılgına dönen rejim kuvvetleri karayollarını tekrar geri alabilmek için karşı ataklar düzenlemekte ve çarpışmalar aralıksız sürmektedir.

□ 4 helikopter düşürüldü. Bu helikopterlerden biri (8-M) içindeki 8 personeli ile birlikte peşmergenin eline geçti.

□ 13 tank yakılarak tahrip edildi.

□ 7 buldozer, 46 askeri araç, bölgede bulunan tüm askeri ve resmi kurumlara ait binalar yakılarak yerle bir edildi.

□ 226 adet hafif silah, 14 adet RPC, 21 adet büyük telsiz, 10 adet küçük telsiz, 1 adet 82 milimlik top, 2 adet kumbaralı (BKG), 1 adet 14,5 milimlik kumbaralı, 32 Diktariyof, binlerce mermi, 3 adet tank, 3 nakliyat arabası, 3 askeri araba, 1 adet damperli kaldıraç, yüzlerce telefon cihazı peşmerge kuvvetlerinin eline geçti.

□ 15 günlük bu askeri eylemler sonucu peşmerge, 17 şehid, 25 yaralı verirken, sivil halktan 25 kişi hayatını kaybetti.

□ I-KDP ve YNK peşmergeleri 23.5.1987'de geniş çaplı bir askeri operasyonla Şaklava'yı kurtardılar.

foto. ANK



Bamerne — Revanduz!

- Bamerne kurtarıldı.
- Revanduz'daki BAAS merkezi ile polis ve istihbarat merkezleri tahrip edildi.
- Bamerne askeri havaalanı ve diğer askeri üsler peşmergenin elinde!

Güney Kürdistan • ANK

Irak Kürdistan Demokrat Partisi'nin açıklamasına göre, 20.5.1987 günü Revanduz halkı işgal güçlerine karşı geniş bir direniş başlattı. İşgalci güçlerle şehir halkı arasında şiddetli çatışmalar başladığını haber alan I-KDP ve CUD güçleri, Revanduz'daki düşman üslerine karşı bir saldırı düzenlediler. Kısa bir süre içinde BAAS güçleri dağıtıldı

ve peşmerge şehri kontrol altına aldı.

Peşmerge güçlerinin başarılı saldırısı sonucu, Revanduz BAAS binası, polis ve istihbarat merkezleri tahrip edildi. Çok sayıda BAAS görevlisi ve Irak askeri öldürüldü.

Peşmerge güçlerinin başarılı eylemlerinden sonra hükümete bağlı özel birlikler, Caşlarla (Karşıdevrimci Kürtler) birlikte Akoyan bölgesinde karşı saldırıya geçtiler. Peşmergenin kararlı direnişiyle kırılan saldırıdan sonra, düşman Revanduz içlerine çekilmek zorunda kaldı.

Bu saldırı sırasında 24 caş, silahları ile birlikte peşmerge saflarına katıldı.

Eylem süreci boyunca içlerinde bir albay ve iki caş komutanı ile birlikte 100'e yakın polis ve asker öldürüldü ve peşmerge çok

sayıda silah ve cephane ele geçirdi.

Revanduz saldırısı sırasındaki başarılı eylemlerinden ötürü, şehir halkının büyük bir bölümü peşmerge ile beraber şehri terketti. Öte yandan yenilginin hırsı ile Irak Hava Kuvvetlerine bağlı jetler Revanduz'u bombaladılar.

I-KDP Başkanı Mesut Barzani'nin yaptığı açıklamaya göre, partiye bağlı peşmergeler 27 mayıs günü BAMERNE'deki Irak Askeri Hava Alanı ve askeri üslerine karşı başarılı bir saldırı gerçekleştirdiler.

Çetin bir mücadeleden sonra Peşmerge güçleri iki askeri üs ve iki karakolu ele geçirek tahrip ettiler. Ayrıca Kürt köylerini bombalamak için kullanılan askeri hava alanı da ele geçirildi ve imha edildi.

Bu saldırı sırasında 100'ün üstünde düşman askeri öldürüldü ve fazla sayıda düşman askeri de yaralandı. Aralarında subayların da bulunduğu 58 asker de esir edildi.

Saldırı da ele geçirilen silah ve cephanelerin bir bölümü ise şunlardır: "2 zırhlı araç; 3 askeri otomobil; 1 askeri cemse; 1 Brazili otomobil; 3 Toyota marka otomobil; 95 Klaşınkof; 84 Selib, 23 Birno marka tüfek; 105'lik 4 telsiz cihazı ve binlerce fişek"

Peşmergenin düşman işgalinden kurtardığı Bamerne kasabası, TC hududuna yakın olup stratejik önemi olan önemli bir merkezdi. Ayrıca, Duhok iline bağlı askeri güçlerin önemli bir ikmal merkezi idi.

□

Pêşmerge gav bi gav Kurdistanê rizgar dike!

Kurdistan Başûr • ANK

□ Di navbera 13.5.87 heta bi 21.5.87 an li herêma Seidsadiq, Helebçe, Sîrwan, Xurmal, Şanederî û Erbet şerên dijwar li dar ketin. Ber xwendana gel bi alikariya pêşmergeyan berdeham dike. Pêşmergeyên girêdayî PDK-I û YNK, ji bo ku berxwedana van herêman neyê şikestin, tevî gundiyan bi aktîfî berxwedanê dihûne. Piştî şerên dijwar, Sîrwan û Xurmal hatin rizgar kirin. Ji ber sedema serketina şer, milîsên BAAS bi çekên xwe ve ketin nav şoresê. Ji ber wê yekê rejîma BAAS mintiqê tevî bombebaran dike. Tevî ku zanînek vekirî di derheqa xisarê de neketiye destê me jî, lê xisara maddî pir e.

Ji aliyê din, di van herêman de gelek hacet û çekên leşkerî ketin destê pêşmergeyan. Hêzên YNK û PDK-I bi hevkarîyê xurt berdehamî kar û xebata xwe a herêmê dikin. □ Li bajarê Silêmanî jî bo rêlibergirtina alikariya herêmê, rejîma BAAS, derketina ji mal qedexe kir, lê li hember hemû astengan ji navenda bajêr, alikariya gundan nayê birin.

□ Li bajarên Silêmanî û Erbilê, dengê radyoya Kurdistanê, bê westin weşanên xwe dike û gazî xelkê dike da ku li ber xwe bidin. Radyo, di weşanên xwe de agahdariyek gelek fireh dide û çalakîyên ku li Ewropa hatine kirin jî bi firehî diweşîne. Weşan; nexasim jî bo gundên girêdayî Erbil, Silêmanî, Mûsilê û Dihokê tên kirin.

□ Di navbera 20.4.1987-15.5.1987 an de, li gor îstatîstîkên ku hatine dan, di nava 15 rojan de, pêşmergeyan PDK-I 122 çalakîyên leşkerî li dar xistine. 4 ji wan bi YNK û 28 jî bi CUD re li dar xistin. Meriv kare encama van 122 çalakîyan wilo veke;

•12 binikên leşkerî ên stratejîk ketin dest û hatin tehrîp kirin û binika leşkerî yê Kanî-

masî jî ket dest.

•Karadax piştî şerê dijwar rizgar bû.

•Dijmin 291 kuştî da, ji van 14 kes bi mirîti ket destên pêşmergeyan. Di nava wan de 8 albay, 1 albayê asîman, 1 jî albayê piyade hebû.

•Di encama çalakîyên de, 600 leşkerên Iraqê û cheş (ji wan 412 bi çekên xwe) ketin nav rezên pêşmergeyan li herêma Kanî girêdayî nehiya Derolûk, navça Dihok. Di nava wan de du qumandanên cheş yê rutbebi-lind jî hene; *Abdulvahîd Nerweyî û Selîm Çeyî.*

•259 leşker hatin êsîr kirin, ji wan 137 kes birîndar in.

•Pêşmergeyan girêdayî PDK-I û CUD, riyên mezin ên bejî -*Kanîmasî-Zaxo, Bamerne-Sersing, Derelûk-Amedê-xistin bin kontrol û gera xwe. Ji ber vê qontrolê, têkiliyên leşkerî ên rejîma Iraqê hatin birin. Ji vê sedemê rejîma Iraqê herêmê bombebaran dike.*

•4 helîkopter hatin xistin, ji wan yek jê (8-M) bi 8 kesên xwe ve ket destê pêşmergeyan.

•13 tank hatin şewitandin.

•7 buldozer, 46 erebên leşkerî û avaniyên girêdayî sazumanên fermî tev hatin şewitandin. 226 çekên sivik, 14 PPC, 21 telsizên mezin, 10 telsizên biçûk, 1 kanon (82 mil.), 2 kumbarali (BKG), 1 Kumbarali (14,5 mil.), 32 Diktariyof, bi hezaran berik, 3 adet tank, 1 damper, bi sedan cihazên telefonê û bi hezaran fişek ketin destên pêşmergeyan.

Di encama van çalakîyên 15 rojî de, 17 şehîd, 25 birîndar û ji xelkên sivil jî 25 kes şehîd bûn. Ji ber bikaranîna çekên kimyewî bi sedan birîndar hene.

Pêşmergeyan PDK-I û YNK di 23.5.1987 an de li nehiya Şaklawa operasyonê leşkerî darxistin û herêm rizgar kirin.



Bamernê—Rewanduz

- Bamernê hat rizgarkirin.
- Li Rewandûzê navenda BAAS, navendên polis û navenda parastinê (istixbarat) hatin kawilkirin.
- Balafirgeha leşkerî ya Bamernê û bingehên (ûs) leşkerî ketin destê pêşmerge û hatin kawilkirin.

Kurdistan Başûr • ANK

Li gor agahdariya PDK-I di roja 20.5.87'an, saet 9'ê sibê de li Rewandûzê xelkê bajêr li hember hêzên dagirker berxwedanek fireh çêkirin.

Di navbera hêzên dagirker û xelkê bajêr de şerêkî mezin qewimî. Gava hêzên pêşmerge jî ve rawêş agahdarbûn, hêzên PDK-I û CUD bi hev-

li diji navendên dijmin êrişek pêkanîn. Di nav demê kin de hêzên BAAS şikiyan û kontrola bajêr kete destên pêşmerge.

Di encama vê erîşê de; navenda BAAS ya navça Rewandûzê, navenda polis û parastinê hatin kawilkirin. Gelek BAAS'î û leşkerên dijmin hatin kuştin.

Li hember vê erîşê serketî hêzên taybetî yê hikumetê li gel caşan li herêma Akoyan erîşekî mezin birin ser hêzên pêşmerge, lê hêzên pêşmerge ev erîş jî şikand. Hêzên dijmin her bi navça Rewandûzê reviyân.

Di vê erîşê de 24 caş tevî çekên xwe hatin nav hêzên pêşmerge li gel pêşmerge hember hêzên hikumetê şerkirin.

Di encama vê erîşê de albayek û du qumandarê caşan li gel zedeyî 100 leşker û polis hatin kuştin û gelek cebirxana û çekên sivik ketin destê

pêşmerge.

Piştî vê çalakîya serketî xelkê Rewandûz li gel hêzên pêşmerge jî Rewandûz derketin. Balafirên dijmin hatin ser bajêr, gelek bombe barandin.

Herweha li gor daxuyaniya Serokê PDK-I berê Mesûd BARZANÎ di roja 27.5.87' an de pêşmergeyên PDK-I erîşekî berfireh birine ser navendi-yên leşkerî yê Iraqê li navça Bamernê.

Piştî şerê dijwar pêşmerge du bingehên leşkerî û du qereqolên giring girtiye. Di balafirgehê leşkerî ku hêzên dagirker bikardianî, balafirên ku ji wir radibûn gundê Kurd bombebaran dikirin, ketiye kontrola pêşmerge û balafirgeh hatiye xerakirin.

Di vî şerê de zedeyî 100 leşkerê dijmin hatiye kuştin û bi dehan leşker jî hatiye birîndarkirin. 58 leşker jî hatiye dilgirtin di nav wan de gelek zabî hene.

Di vî şerê de destkeftên pêşmerge ev in; 2 zirêpoç (zırhlı araç) hejmara wan 8904 û 8990, 3 otomobilê eskerî; hejmara wan 15175-151389 û 151388, 1 kamyon eskerî; hej:142391, 1 otomobilî brazîlî; hej:3782, 3 otomobilî Toyota, 95 keleşnikov, 84 Tifingê Selib, 23 tifingê Birnowesat, 4 cihazê bêtêl 105, Bi hezaran fişek.

Di vî şerê de pêşmerge *Fewzî Remezan Reşo û Sedîk Binavî* şehîd ketine û 3 pêşmerge birîndar bûye.

Navçe BAMERNÊ navçekî gelek stratejîk e, ji ber ku ev navçe navendiya cûn û hatina hêzên dijmin li parezgehê Dihok bû. Bamerne nêzikê hîdûdê Tirkiye ye.

Despêk di hejmara 17'an de

Bû sibe icar pere tune!... Ciwan Elî, bira-yê mezin hat. Bi tirkî go "Kurd Hesên, gel bînbaşı senî çağiriyor", "yaw bînbaşı ben-den ne îstiyor?", go "o da mahkûmdur ma-pustur.."

Ez çûm ba wî, nîşan tune. Rûniştîye, jê re digotin Elmî Beg, xelkê Stenbolê ji malbata Sultana bû. Xwarziyê Îsmet bû. Ji yê îdamê bû, hevalê Raûf Paşa wana îdam kirî-bû...Li cem wî runiştîm, ji min pirsî, go; "Ji ku yî?" Min go; "Ez ji Diyarbekirim" go; "ji qeza, an ji gund?" Min go; "Ez ji gunda me" go; "Kijan gund?" Min go; "Tu nizani bînbaşı.." go; "Yaw sêle, belkî bîlîrîm... (bêje belkî ez dizanim)" Min go; "Welle, Ez ji Serdê me" go; "Tu ji Serdê yî?!, Çima te nasnakim?!" Min got; "Te ez li kur dîtîme bînbaşı!" go; "Yaw, di seferberlikê de tebura min li ber çem bû, li pirê bû û dinya jî sar bû. Çil roj ez li odê gund raketim" Min go; "Ne Bînbaşı, em wê çaxê ne ê odê bûn, em zarok bûn" go; "Ez tim li ser textê nivînan dimam" Gava wilo go hat bîra min. Li wê derê Bînbaşiyek hebû, za-bitêk bû nizamim çî bû! Em diçun şekir di-dane me. Min go; "Te şekir dane me" go "erê" Min go; "Hat bîra min" got; "Tu navê min zanî?" Min go; "Wele bi aqilê min digotin Elmî" go; "Bak benim ha-aa!(binêr ez ew im ha!)" go; "Pereyê te.." Min go; "Tune! du quruş bi min re heyê" go; Yaw, gundê wilo dewlemend, gundê avî baxçe û tişt çawan?..." Min go; "Te em dîtîm" go; "Erê di gundê we xaniyê yek te-baq tune bûn. Gundekî biçuk bû, lê gundekî zengin bû. Her malê de belkî bîst dest livîn hebûn. Firaqê malê jî wilo zêde bûn" Min go; "Te baş dîtîye. Me tasek avê sêdeqe xwe bi xwe re anîbû çiya. Gundî gişt mîna hev bûn! Hemû hevalê hev bûn..." go; "Gor-yorsen bu dînsîz Mistefa Kemalî goruyorse-nîz (Dibînê ev Mistefa Kemalê bê dîn çî di-ke!)"

Rabû derxist 160 kaxit da min wî camerî. Wî çaxê 160 kaxit gelek bûn. Ez çûm min ji xwe re pê ew nivîn kirin û min ji xwe re tişt mişt kirin. Em sê sal li wir man....

Tirkan efû umumî dan. Em derxistin der ve li wir jî em şes meha man. Paşê em wegeriyan welat, hatin nav kavilên xirabe. Gund şewitiye pîrek û zarok di nava bexçan de dijîn, giş mîrên û bavêr wan şehîd bûne. Zarok Sewî mane...

Min fêhm kir ku ev efû bi hesab e. Ji bo şikênandina şerê gerilla ye. Ordiya Tirka nikarbû zora gerillayê Kurd bibê. Hinek ronakbîrên Kurd daketibûn Suri. Li Şamê ce-maata Xoybûn çekirî bûn. Li gel xebata tanzîmî (rexiştinî) kovar û pirtuk ji diwe-şandin. Li çîyan jî hêzên wan hebû. Ji bo ronakbîrên Kurd bixşînin hundir û serê çîyan wan (gerillayê Kurd) daxin efû dabûn.

Lê gava efû dane, me pê nizanibû ew raqê me yê hepsê vegevandine qezayê me. "Bun-lara bir çare bulunuz-çarekî ji wan re bi-bînin"...

Dijmin mirovên me dikuştin. Tişt dixistin berîka hinekan, hinekan makîne li wan di-qelisardin...

Çar zarokê Cemilê Çeto bi min re bûn. Vegeriyan malê, Tirk wana girtin bi xwe re birin li geliyê Kelanê kuştin.

Ez çûm Diyarbekirê min xanî kirê kir li wê de rê man.

Apo kenge ji hepisxana Nixde derket?

Ne min go! di 16'ê meha gulan ê 1928'an de em ji hapsê derketin. Em vegeviyan welat. Ez çûm li Diyarbekirê mam. Li ber de-riye Ulu Camiye îlanet daliqandibûn. Di îlanê de di go "Tapu midurê Qulpê tune, ki dixwaze şuna wî bigre bila îstîda bidne day-ra tapuyê li Diyarbekir". Min jî çu îstîdayê da, min go hema dîrkevîm, sopa xwe bi-dim hudakirinê. Evana dikujin. Efû tine de-rew çî efûye çî hale. Ez çum em ketin îmti-hanê. Ji me 14 sual kirin, min duwanzdeh dan dido min nizanibûn. Du sual jî şerîetê bûn wana min nizanibû. Suala hevalên min şes bûn wana kemtir bû. Peşî ez der ketim. Ez çûme Qulpê li Qulpê midurê tapu bûm.

Yekî çerkes jî mistendiqe, ew jî bi min re di wî xaniyê de ye, jina wî heye, ê min min nebiriye. Min diya mistefa nebiriye li gund hiştîye. Hikumeta Tirka wê çaxê icbarî ki-riye, gereke herkes jina xwe bînin, bèn Hal-kevî, dansê bikin. Jina min tune ez rehetim, ewê Çerkes gelekî acize feqîro.



zêr zanid
zor zanid
devê tîfingê
mor zanid

BÎRANÎNA HESÊN HÎŞYAR

Biştî 63 Sal

Berxwedana Şêx Seîd

Wê çaxê sewra (şores) Agrîdag veket, di bîstûnehan de. Di ber min de esker ji Diyar-bekir tîn, top û meqeret û qiyamet dikşin, aliye Muşê de diçin û ez li wan dinêrim. Min kir nekîr, min tebat nekîr. Law vana di-herin ser mîletê min û ez hê nanê wana dix-wum. Ewe Çerkes tê ruyê min ji min re dibêje;

"Heval tu do hatiya. Hê dora te nehatiye. Tu piçek bisekine."

Le kir nekîr min tebat nekîr. Ez jî wir çûm gihamê sewra Egrîdagi yanê Ararat. Îhsan Nuri li wir bû. Rehmetî Îhsan Nuri ordiya Tirka de zabî bû. Bîst û çaran da min ew li Diyarbekir de mala Heciyê Şira de dîtibu. Min wî nasdikir. Wî ew Sewre tenzîm kir. Generalê ordiyê Tirka jî Abdullah Alpdo-ğan û Salih Omurtak bûn.

Ewana (Tirka) li her derî dişkestin. Lê sed mixabin meselîhê duwelî her di singê mede ne. Rusya hidudê Eriwanê û Qersê dagirt ti-je esker kir. Îranê jî hidudê xwe tije kir em hatin pêcandinê. Sewre ma birçî bi careke xwarin nema Tirka destbi kuştinê jin û za-rokan kirin. Me ji wan (Iran) xwest, her du aliya jî em lacî qeubul nekîrin. Bi qiwetê si-leh em biniya kilîse kendê derbas erdê Ecem bûn. Li wir jî ecema li me xist. Em hinek vegeviyan welêt yê dinê li wir man. Paşê lacî qeubulkirin. Îhsan Nuri rehmetî li Tehranê bû hetanî 76 an. Li Rizayê moto-siklêtê lê qelibî, SAWAK bû, MÎT'ê Tirka bû, qeder bû edî nizamim. Em vegeviyan welat, em di welat de jî man sê sala, me mifreze çekirî bûn, pişt Diyarbekirê heta Çebexçê em mifreze bûn 1924 an de hati-me Suri...

"1934 an de..."
Sî... sîû çaran de
"Belê,"

Wê çaxê Franse li wir mandater bû em qe-bulkirin lariyê siyasî em li vir man.

Me rojekî xweş nedît. Jiyana me di nav şer, perîşanî, mirin û neçariyê de derbas bû. Kurdistanê gund bi gund şewitandin. Merowan dixistin nav mala û axura dişewi-tandin. Di 1928'an de berî efû be li hapsxa-na nixdeyê, ji min re qezete dihatin. Milli-yet bûn, tê de wa nivîsbûn; "Li Rojhilata

Anadolê -Doğu Anadolu'da- de nav sê salê de 700 hezar merow hatiye kuştin." wan ni-vîsiye tiştê ha hefsed hezar. Ji vî hefsed he-zarî bawer nakim si (30) hezar şoresşger hebîn.

Giş jin û zarûk bûn kuştin, dikuştin, bi vi-ya zehmet dabûn mîlet ku jin û zarûkan di-kujin. Elî Heyder hebû, mintike qumenda-niyê ku xelk dikuştin, dibêje: "min li gun-dekî giş tistin xanîkî li ser qaye kî xayînteqe ev gund piştî farqîneyê li hel-lehe, hundirê wî xanî min tije kirin û min agir berda wan û li ser xanîyek din sekinîme û godarî dikim, bû wî xanî wan jin û zarûkan, du xort emrê wan sêzdeh-çardeh salî bûn, ketme eywanê agir jî û lo wek cawê sor li wan pê tîve dan, pêvedidan, hatin ku xwe bavêjin, mezekirin xanî li tebaq li ser qeyakî bilinde 'bînerêbilinde'. nikarbûn xwe bavê-jin di bê min dît herdu hevdu ulo hemêzkirin û nav wê pêti agirde hun dabûn; 'yalanîz o zaman gördüm, iki kişi, iki insan öldüler' dibê carek ji min xistibû hundirê xanî kî er-dîbû, esker dora wîye, zarûkek deh salî ji nav agir bazda ket nav derî çav li min ket ku ez dîtîm paş de çu nava agir, li vir dibê ez fi-kerîm, gelo ew zarûkî zilma min ji agir me-zintir dît çu nav agir an Kurd mîletekî enyê-din nexwast mineta dijmin hilîne, agir qe-bûl kir nizamim çî bû" dibê ew dibêje. Bi vî jî fexra xwe dike evqas insan şewitandinê.. Sewra Dersîmê şes meh Paşê Îsmet çûyê wêderê gotiye: "onbeşyışından aşağı olanları öldürmeyin, yani yukarı olanları öldürün"; şes meh piştî ha! Vana meselê Kurdistanê..Û qetliama geliyê Zilan de. Geliyê Zilan de, Egrî dagê de, Areret yanî..

Yuzbaşîk dere Germava Adema... Sed sivarî pe re ye. Muxtarê gund re dibêje: "Yalla, tu û kurê xwe herdu herin bajêr ji me re ara-qe û tiştan bînin". Êee, dibên:
"Yaw, gundî em bişênin, em çima bi-çîn?"
"Na, hân hersê herin"

Dikin, nakin wan dişênin..Wana diçin. Jin û..jina wî û bûka wî tînin odê ara-q didin wan û heşa işê xirab bi wan dikin, didin bin linga namusa wan. Mêrik vedigere tê, jina

wî dere pêşiya:

—"Ji kude têtî? Namus çû!"
—"Çima? Çawa?"

Dibê hal û mesele "Ez û bukê te birine nav odê"

Mêrik vegevand. Go: "Ne li vir bûn"; go: "Wele em ji te nêrin, me go heta hun bîn"; go: "Rajê tîfinga xwe." Raj tîfinga xwe, ew sed si-varî tevî yuzbaşî biserve kuştin di hundir de. Li sed mixabin bûka xwe û jina xwe jî kuştin rebena. Ma sîcê wan çî bû, kuştin?

Haîin giyane me. Gotin, hal û mesele ev bû ye. Ê, li ser wî Seyidxan û Elîcan û Ferzende her yekê qederê pîncî siwarî bi wan re, ketin deşta Ademan û Spîkan û Hesenan. Li wir der-be-yê mezin bi esker xistin. Tofan bi wan de anîn, hatin. Ê..nikaribûn îca rabûn çî kirin! Tilgraf şandin Enqerê, li pişt cephe gundî me ve re dibin. Ji bo wan bikujin. Ji gundê Hese-nan, Ademan û Spîkan sed û heştê gundî çil û heft hezar jin, zaruk û extiyar berevkirin anîn li çemê Zilan newala Dêrê, bi ser hev de dane ber mitralyozan. Piştî wî esker daketibûn nav wan ê kû birîndar hene bi sungiya temam dikirin bi-zano!!Li wê de re ana jî girê hestiyane çil û heft hezar bi yek cîkî de. Tirk jê re dibên Zilan Faciasî...

Ji wî bîst salî ketime sewrê, di vî gotina min de ez ketime umrê 78 salan, me ronayî nedît. Ji tariyê pê ve. Me xweşî nedît, ji dilbirîniyê pê ve. Lê belê bawerîya min xurt e. Ti zilm û qiwet tune ku mileta bi heqa wan ve hunda bike. Îro Kurdistan gişt diheje. Tevî ku partiyên wan na-bîn yek jî, her yekî aqil kî heye jî li Tirkiyê li Îranê li Iraqê sewrê li hercî dehe jî, ew mîlet heq distîne. Tu quwet tûne ku li pêşî bergar vî, li pêşiya heqê wan bigre. Bawerîya min heye ku, hân xortê nû hunê bê pasaport ji Hecica hetanî hidudê Gurciya, û ji xerbê Sevasê hetanî Ker-manşah hunê bê pasaport bigerinin.. Bawerîya min bi viya xurt e, hun dibînin. Lê belê ême umîr giye payîzê çûye perweşinê.
—Spas bo te..

□□□□□□□□ Dawî □□□□□□□□

□ Ew Dozgerê Tirk (savciyê Tirk) yê "navdar" ku di rojname, radiyo û televzyona Swêd de tê behskirin, ji demê dîrdirêj de di aliyê hinek kesên ji Kurdistanê û ji Tirkiyê de dihat nasîn. Serketîya Federasyîona Komelên Kurdistanê jî van demên paşin ji pirsê dozger agadar bû. Ji bo pirsê dozger dilnexwesîya xwe nişanî maqamên Swêd kir û dewwaz kir di demek kurte çareserîyek ji bo vê meselê bête ditin.

Çend welat perwerên Kurd berrî heft-heşt salan li ser pirsê dozger sekîn û gelek caran jî mesela dozger anîn ba demûdezhêhên (maqam) Swêd cara pêşin di sala 1979 an de, di aliyê çend kesên Kurdperwer de pirsê dozger birin ba serektîya Daîra Karûbarên Muhaciran. Bi taybetî li gel Serek Mirza Tord Palmlund li ser pirsê dozger peyîvîn. Welatperwerên Kurd şik û gumanên xwe pêşkeşî serektîya Daîra Karûbarên Muhaciran kirin; "Ew xeterek gelek giringe, kesek wusa bişik û guman di dergehê daîra muhaciran de wek werger û pispore kar dike. Bi taybetî tehlûkeyek dijware ji bo kesên Kurd û Tirk dexwazîyan penaberîyê dikan. Di pêşeroj de ewê pirs û pirs gerekên dijwar ji bo penaberan û hukumeta Swêd peyda bibe". Lê çê mixa bin, serektîya daîra muhaciran tenegehîşt giringîya vê balkêşîyê. Serektîya daîra muhaciran piştgirîya karmendê xwe wusa beyan kirin; "Em bi karmendê xwe bawerên û tû şik û gumana me li ser wî kesî çê ne bû ye. Cara dudîyan di sala 1980 an de, di terefê çend Kurdan de li civînekê de gazinîyên xwe pêşkeşî serektîya daîra muhaciran kirin. Ew sal bû dozger wek pispore û werger cîhê xwe li daîra karûbarên muhaciran de qewîm kir û karek dayîmî stand. Lê çê heyfe, daîra muhaciran bersiva û ditînen xwe ne guhart û bi vê kirinê jî tewra xwe nişanî wan kesên xwedî gilî û gazinan kirin.

Ma em çêbikin?... Li welatê me de, dozgerên hukumeta hov bi qanûnên xwe yê ne mirovatî li ser çarenûsa gelê me biryar digirin. Bi van qanûnên hov tawabari û zordestî li ser gelê me dikan. Tekoşer û rizgarîxwazên Kurd bi bendên wan qanûnên ne demokratîk tên kuştin û girtin... Ew welatperwer, demokrat û şoreşgerên Kurd yê ji zordestî û tawanbarîya hukumet Tirk direvîn tên Swêd jî icar Dozgerê Tirk li ser dexwazîya wan ya ji bo bextxwazîya siyasî lêkolîn çêdike û "biryar" digere ku ew kesana dikarin li Swêd bimînin anjî na. Ma ew dozgera, yek ji wan dozgeran ne bû li dadgehande li ser Kurdan biryar dida?

Belê ew Dozgerê Tirk çawa "pirsporî û lêkolîn" ji bo Daîra Karûbarên Muhaciran dike. Dema belgeyek, ewraqek fermî anjî pîrsek li ser bextxwazekî pêşkeşî demûdezhêhên (maqam) Swêd dibe. Demûdezhêhên Swêd jî ji bo lêkolînekê wan belge û ewraqên fermî anjî wan pirsê gereken dide pîrsporê xwe yê dozger. Dozgerê Tirk ji di terefê xwe de û bi rêûregehên xwe yê fermî anjî nefermî li Tirkiyê lekolîn li ser wan belge û ewraqên çêdike...

Paşîyê, Dozgerê Tirk "rastî û nerastîya" wan belge, ewraqên fermî û pîrsgerekan pêşkeşî Daîra Karûbarên Biyanîyan dike. Gelo, Dozgerê Tirk çawa dizane ew belge û ewraqên fermî "raste anjî nerastên"? Divê dozger jî hinek cîh û maqaman bipirse... Belê ew jî demûdezhêhên hukumeta Tirkiyê û ji hevalbendên xwe dipirs e... Dûra berhema enformasyon û lêko-

□ Dûnya tarihi gerçeklerle doludur, ancak gerçek olaylar yaşandığı zaman insanların çoğu bu olaylar karşısında insanı insan yapan insani düşünce ve değerleri tali plana atıp, siyasi düşüncelerini çıkarlara bağlı olarak ön plana alıp, bu çıkarların gerektirdiği gibi düşünce belirleyip siyaset yapmaktadırlar. Doğal olarak bunun sonucunda gerçekler kabullenilmiyor ve sorunların çözümü on yılları hatta yüz yılları almalarına neden oluyor.

Bu kısa ve genel giriş yaptıktan sonra asıl sorunumuz olan Kürdistan gerçeklerine kısmi olarak bakalım.

A) Irak Kürdistanı: Bugün Irak Kürdistanı'nda devrimciler, demokratlar, ilericiler ve komünistler belirli oranlarda eylem ve güçbirliği yapmışlardır. Emperyalizmin uşağı gerici faşist diktatör Irak devletine karşı amansızca mücadele etmektedirler. Tabii bu devrimci-demokrat güçler mücadele ederken eli kanlı düşmanda hayatîyetini korumak, gelişen ve onurlu mücadeleyi bastırmak, ulusal ve sınıfsal hak ve taleplerini yok etmek ve baskı altında tutmak için elinden geleni arkasına koymuyor.

Dozgerê Tirk Li Swêd

Şoreş Zîrek

lîna xwe pêşkeşî karmendên Daira Karûbarên Biyanîyan dike û ew karmendên Swêdî jî, li ser dexwazama wî bextxwazê Kurd-Tirk biryar dide...

Di van salên borî de gelek belge û ewraqên fermî yê di terefê bextxwaz an de pêşkeşî maqamên Swêd bû ye, ne hatin pêjrandin. Berqû, li gor bir û bawerîya dozger ew belgena "sextene". Ji ber wî, bi sedan bextxwaz û penaberên Kurd-Tirk bi vî awayî di agrê dozger de şewitîn. Hinji bi sedan bextxwaz û penaber Kurd û Tirk benda fermana derketina xwe ne. Li ser pirsê vi dozgerî û bi vî awayî li ser pirsê bextxwaz û penaberan lêkolîn kirin di aliyê Rêxistina ji bo Parestina Mafên Biyanîyan û çend avukatên biya nîyan bi xurtî li rexne hat girtin. Lêkolînen wusa li dijî qanûnên parastîna mafên biyanîyane. Îro li ser vî pirsê munaqesên gelek dijwar navbera avukat û daîra karûbarên biyanîyan de dibe.

Di vî "rewşa hesas" de, paş hindek bûyerên li Swêd bûn û dayîn û standina Swêd li gel dewleta Tirk "baş" bû, ji ber van sedeman hukumeta Swêd hewl dida,

derûdergehên xwe ji bo bextxwaz û penaberên Kurd û Tirk bigre. Ji bo vî jî hewceya hukumeta Swêd jî bi pispore û enformatoran" wusa re he bû. Peyda kirina "pîrspor û enformatoran" ji bo hukumeta Swêd ne weqas dijwar bû. Berqû dexwazî û mefata hukumeta Swêd û Tirkiyê di pirsê bextxwaz û penaberên siyasî de digihştin hevdu. Ew kesên ji bo mefata hukumeta Tirk bi salan li wê dera kardikirin nûha xwe amade kirin ji bo parastina menfeata dewleta Swêd. Bi alîkarîya kesên wek dozger, pîrsporên li ser rêxistinên biyanîyan, memostên zîmanê zikmakî yê tirkî, yek-du tercumanên "xwefiroş" û çend "bazirganên balyozxana Tirkiyê" agadarîyên gelek "heja û girin" li ser bextxwaz û penaberên Kurd û Tirk ji bo menfeata dewleta Swêd û Tirkiyê komdikan.

Gelek caran ji dewleta Swêd "pispore û zanistên" xwe dişînin Tirkiyê û Kurdistanê. Li wê derê li ser bextxwaz û penaberên Tirk û Kurd agadarîyan berhev dikin. Tabii, gelek caran bi tevkarîya maqamên Tirk ew karûbara pêk tê. Li ser van lêkolî-

nanan hinek delîl hene, dema bête xwatin em dikarên pêşkeşî wan bikin.

Dozgerê Tirk caran bi "bertil" alîkarîya hinek kesan dike. Ji bo wan kesan rêdana rûniştin û kar li Swêd bistînin. Em gelek baş pê agadarin Dozgerê Tirk alîkarîya kê kirîye. Dema gelek pêwist be, emê nişanî wan bikin. Bi vî awayî jî di nav multeciyên Kurd û Tirkan hevalbendan peyda bike.

Dozgerê Tirk wextekê bi xwe di televzyona Swêd di beşa tirkî de xwedî gotin û desthilat bû. Nûha jî bi hevkarîya "yara" xwe di beşa tirkî de berdevkiya prapaxande dewleta Tirkiyê li Swêd dikan. Beşa tirkî ya li televzyona Swêd, wek beşek televzyona Tirkiyê li dijî pirsê gelê Kurd û têkoşîna demokratîk ya li Tirkiyê kar dike, propaganda dewleta Tirk ya fermî di nav muhacir û karkerên Kurd û Tirk de belav dike. Di eynî wextê de tesîrek gihştî li ser gelê Swêd jî dike...

Dozgerê Tirk yek ji wan kesan e, amuzdana (imtihan) tercumanan ya dewletê de li ser zîmanê tirkî pispore. Di vî maqamî de, ew bi xwe desthilate li ser pirsê tercuman û wergerin bi zîmanê tirkî. Pîranîya Kundên diketir: vî amuzdanê serfiraz ne dibûn. Qas ez dizanem heta nûha sê anjî çar.

Kurd di vî amuzdanê de serfiraz bûne. Gelo sedem wê çê bû? Ma ew xwedevanên Kurd yê zanîgehên tirkîyê qedandine baş tirkî hînebûna. Na wusa nîne. Gelek xwedevanên Kurd yê zanîgehên bilind li Tirkiyê qedandine baş zîmanê tirkî hînbûn e, ew ditin ya dewleta Tirk û ya ronekbîrên tirkan. Li ditîna dozger cuda ye: "Ew kesana baş tirkî nîzanin".

Li gor gotina dozger, bi xwe wextekê li heremê Çolemerikê, li Kurdistanê Jorîn, ji dewleta Tirk re xizmet kiribû. Di axaftinên xwe de gele çaran "pesna miranî û dilsoziya Kurdan" dikir. Bi van "gotînen" xwe çend kurdên bêhêş xapan û kir hevalbendên xwe. Ji wan kurdên bêhêş yek hinjî tev dozger hevalbendîya xwe didomîn e. Ew kes çend çaran li gel karmendên Swêd yê li Daîra Karûbarên Biyanîyan kardikan çûn li çend heremên Kurdistanê Jorîn gerîyan, ji bo enformasyon li ser muhacir û bextxwazîyan ji wê heremê lêkolînek çekirin. Ew bûyere di terefê gelek kesan de tê zanîn û nuha hin dik ji wan kesan li Swêd dimînin. Ew kes wek tercumanek resmî iro li ba polis, li dergeha balafîrxana Swêd de kardike. Gelek caran jî li ser pîrsgerekên bextxwazan vî tercumanî wek "pispore" nasdikan.

Belê dîroka dozger û "pispore" dînan gelek dîr dirêje. Ne pêwîste hemû di vî nivîsê de bête nivîsandin. Lê dema pêwist be, ewê yek bi yek, nav bi nav were nivîsandin.

Divê em du tiştan jî hevdu cuda bikin. 1-Dozgerê Tirk "vatenîyên" xwe ji bo menfeata dewleta Tirkiyê tîne cîh. Ew jî "pêwîstîya vatenîyên" wi ne. Ew kesên alîkarîya dozger û, maqamê Swêd û Tirk dikan ew jî "pêwîstîya vatenîyên" xwe tînin cîh. 2- Gelo ji bo çê hukumeta Swêd li ser bextxwaz û penaberên hatine welatên wan bi awayî wusa lêkolînen ne durist û bi tevkarîya "pispore û zanistên" iro nokerîya hukumeta Tirk dikan? Ma sedemên vî durûtîyê çyê? Bi bîrûbawerîya min, em bextxwaz û penaberên Kurd û Tirk di vî bazirganîya navbera dewleta Swêd û Tirk de tînin firotên. Çêkirina metroya li Îstanbolê berî parastîna jîyana bextxwaz û penaberin Kurd û Tirk tê.

22.4.1987 • Uppsala

Kürdistan gerçeklerinden birkaçı

Tankıyla, topuyla uçağıyla, bombasıyla ve bütün bunlar da yetmiyormuş gibi bu defa kimyasal silahlarla saldırıyor. Bu insanlık dışı saldırılar sonucu yüzlerce masum insan öldürüldü ve de öldürülmeye devam ediliyor. Ama Irak Kürdistanı'nda mücadele durmadı ve durmayacak. Fakat en önemli olan sorun bugün halen onlarca parti ve örgüt verilmekte olan bu haklı ve onurlu mücadeleye bırakın katkıda bulun-

mayı (ekonomik, siyasal, kültürel) tam tersine onun anti-propagandasını yapmaktadırlar. Bir kısmı da birkaç basit bildiri ile meseleyi geçiştirdiler ve halen öyle yapmaya devam ediyorlar.

Bugün gelinen uluslararası siyasi durumda gerek Kürt hareketlerinin gerekse Türk sol hareketlerinin bir kısmı siyasi olgunluktan yeterli nasibini almamış ve acemice bir politikanın içerisinde spekülasyon yapıp durmaktadırlar. Bu kısır döngüler ve acemiliğin neticesidir ki, halen birtakım örgütler Barzani hareketine gericidir demekte, Kuzey Kürdistan'daki ulusal halk hareketlerine ise, anti-emperyalist değildir demektedirler. Deyim yerinde ise, bu düşünce sahiplerine bir kaç fırın ekmek daha yemelerini ve ondan sonra siyaset yapmalarını tasviye ederim. Bu yazıyı böyle yazdığım için okuyuculardan özür dilerim, ancak eleştiriyi yönettiğim örgütlerin seviyesine ve anlayış durumlarına göre yazdım. Yoksa konuyu anlamaları mümkün mü?

Dersimli Ahmet • İsvaç

Şîretvanê gote min;
Guhê xo baş bide min!

Ez im pîra şîretvan!
Yara pîrê kelekvan!

Dinya ne wek cara ye!
Kelekvanî ne maye!

Pîro bûye baxçevan,
ez jî bûme dergevan.

Evro ez dergevan im!
Maşela xwedevan im!

Her dem li nav reza me,
têra xo şeraze me!!!!

Evîndara rezan im!
Qedre huner dizanim!

Li gor nimra evîne
Hazir be şeva îne!

Pîra evîngehê me,
sala şest û nehê me

Kevnar im, xoş diyar im!
Li nav xelkê navdar im!

Were nik dapîra xo!
Çi Dihok û çi Zaxo

Evîngehê bibîne!
HLunerê wê bixwîne!

Bi zimanê nerm, erê,
mar ji kunê tê derê

Çi bazbend û nivîşt in!
Nezanîne hûn kuştin!

Ne şeva reş û tarî!
Diyar e hêj êvarî

Heke rast e na tirsî!
Bo çi ji min napirsî?

Bê çep û çîr tu bêje!
Bê xar û xîç verêje!

ji rastiye ne reve!
Karê evîne ev e!

Hêdî-hêdî darêje!
Derdan ji dil bavêje!

Soza mîrê Hekarî
gotin zêr û mîrarî!

Ger nekevîm çala reş!
Mîna xezala keleş

Dê şola te bibînim,
bere-bere bixwînim

Lê kes nîne mîna te!
Derma kit birîna te!

Şîreta yekê dê bêjim,
kela dilî verêjim!

Heke tu jê verestî,
rast e tu gulperest î!

Dava gulê tu girtî,
awrên çava tu kuştî...

Marê gulê tu geztî,
ji lew tu jar û mest î!

Sebri BOTANÎ

Soza dil û mergê te,
janê daye cergê te!

Evîna xoş û dijar!
Ax ji derdê Gulbihar!

Xo berdaye dilê te,
tiştek na yê milê te!

Hîş û birên te ew e,
wek di hemî direwe!

Hîş û hizr û dilê te,
çav û gav û milê te,

bûne gorî dengê wê,
pêş dîtina rengê wê!

Bila bes bit badoş!
Tu ne şey dapoş!

Evîn ji dil te dayê,
bû agirê jêrkayê

Heta ku evîn heye!
Jana wê jî her heye!!!

Xoşiya evîn derd e,
gulê bigre û ne berde!

Bê wê dinya wêran e!
Kavlê kevnedêran e!

Bi lez û bez here nik!
Wê gula hestisivik!

Bibîne enya kever!
Canê şîrîn dane ser

Dilê birîn bo weke!
Wê gotinê j'bir neke!

Li ahengên şevîne,
fêr be dersa evîne!

Bibînin hunerê hev!
Têr baxivin roj û şev!

Hezar xudan "macistêr",
ku diyar in weku stêr!

Hemî seyda û efendî
li ser dibin dubendî

Cotyar in ger şivan in!
Ger pale û ger rezvan in!

Hemî mêr û mêrxas in!
Yek-yek gulê dinasin!

Awaz û hunerê wê
bîne bela serê wê!

Kes ne ma xo lê ne da!
Wê dil bi kesê ne da!

Kî ditiye wek niha!
HUNER MABIT BÊ BIHA!

Li jêr simê kerê reş,
diperçiqin gulên geş?!

Sitema dewê kirêt,
ez kirim agir û pê!

Ax ji destê vî dewî
Huner hêla ye sêwî!

Hezard wek min şerejin!
Ji dil û can dihêjin!

Baca evîne xwîne!
"Mem û Zîn" tu bixwîne!

Bes bike lavelavê!
Mil bide ber bizavê!

Bi hunerê sax û germ,
bi xeyala pak û nerm,

Huner bike hezar reng!
Bi hostayî bide deng!

Huner ne wek elmas e!
Bihatir e û binase!!!

Bi huner tu hingavî
di gel xo tu bişavî!

Hûn hatine bişavtin!
EVÎN nayê veşartin!

Vê janê bine derê!
Ne'mre bi vê kederê!

Were bike piyasê!
Tu guh ne de qiyasê!

Ne bêje dem bihûrî!
Pîr na bit gula cûrî!

Her dem kiç e, bê mêr e!
Bi hunerê xo fêr e!

Agirek pîroz û pê e!
Huner ne bit kirêt e!

Evîni ya bê huner!
Tifa min û te li ser!

Gula xo sor û zer ke!
Xemla huner li ber ke!

Teca evîn li ser ke!
Kula dilê xo der ke!

Vêkra bijîn bi aşî!
Evîna pak û rastî!

Neha berde ser deha!
Geş bike sal û meha!!!

Munzur Ana

Toprak kadar yorgun
Ve Munzur kadar canlı
gözlerinde umut yeşeriyor.
Umutki
bir zeytin dalı
ve çoşkun su,
üretken emek...

Hey Munzur ana,
Munzur ana
gözlerinde yeşeren kan dam-
laları
kuruyup uçuyor
Munzur'un duru suyunda..

Actılar,
acıları
ceninde beslediğin,
kucığında ninnilerle
büyüttüğün,
uğruna dövuştüğün
hayatın kendisidir...!

H. Eren ÇELİK

Adı Devrim

düşmüş önüne rüzgarların
And dağlarından aşağı
savrulur
bayraksız halkların güneşi
için

varmış önüne türkülerin
Pirenelerden Munzurlardan
aşağı durur
umutsuzluğuna karşı
yenilgilerin

almış önüne selleri
Himalayalardan aşağı
akar
toplayıp ezilmiş halkların
son gözyaşlarını

katmış önüne ateşleri
kara Afrikanın bozkırlarında
yakar
zincire vurulmuş kavgalanın
yüreğini

adı devrim
mavi tulumlar giyer
her yerde

gelir
hiç beklenmeyen günlerde!

Mart-Nisan 1987

Asi YAR

Nezîr XEYLANÎ

• Şoreşa Kurdistanê jî wek şoreşên gelên dîtir ne bi tenê çek diçe serî. Şoreş di nav xwe de wek hemî tiştan hûnermend jî digihîne, Nezîr Xeylanî jî yek ji wan kesan e ku hûnera xwe ji bo gelê xwe çêdike. Di nav gelek zehmetî û neçarî de bi xebata xwe yê hêja beşdarê barê şoreşê dibê. Nûçevanên *Kurdistan Press* li Kurdistanê li gel hûnermendê heja kak Nezîr Xeylanî hevpeyvînek li ser karê wî ya hûnermendî çêkiribû em vê hevpeyvîne bo xwendevanên xwe pêşkêş dikin.

Tu dikarî bi kurtebirî li ser jiyana xwe ya hûnerî rawestî?

Di sala 1953 an de, li Şeqlawa, li Kurdistanê Iraqê hatime dinyayê. Di sala 1965 an de min dest bi karê hûnerî kir. Wî demê, min pişikdarî li karên traşî nedikir, li ser berî li xwendegaha.

Salên 1979 heta 1986 ez ketim nav rezên hûnerî li Iraqê û karên min bo cihê rizamendiyê. Karên ku min pişikdarî kir ew e; - Min li hemî pêşangehên çandî yên Iraqê û li derveyî Iraqê pişikdarî kiriye.

- Min li pêşangeha karên destî û pêşesaziyên çandî li pêşangeha Bexda ya dewletî ya 22 emîn kiriye.

Her weha min çend karên taybetî kirine;

- Sibata sala 1982, min pêşangeha xwe ya yêkan vekir.

- Sibata sala 1983, min pêşangeha xwe ya duyemîn dana li Erbilê.

- Yê sisêyan, li Bexda, li tîrmeha sala 1983 bû.

- Ya çaran, li Erbilê bû, di 9.1.1984 an de bû û 21.1.84 an de hat dubarekirin.

- Ya pêncan li 27.11.84, li Bexda hat danan û dîsan li 10.12.1984 hat dubarekirin.

- Li ser daxwaza bingeha rewşenbirî û belavkirina kurdî ewa ser bi Wezaretê Ragihandinê, pêşangeha heftan di 9.2.1986an de li Silemaniyê hat danan.

- Li ser dawa mamosteyê û danîşgeha Selaheddîn pêşangeha şeşan li 11.5.1985 li malbenda danîşgehê hat danan.

Çima te ev rengê hûner hilbijart?

Ez nizanim ji ber çi min ev rengê girtî dibîtin min wek arezûwekê (hobî) vîyabît. Her çawa bit dîrok karê weha bîr diket. Min zarokiya xwe hez dikir. Ez bera bitnaşim û tiştê jê çêkem.

Te çi divêt ku xelk ji kare te bizanin?

Ez dixwazim êş û janên gelê Kurdê bindest bexim ber çavê xelkê û ewan bi çandî Kurdî ye xwanedan herweha ez rexna xwe diyardikem li ser karên şovenî û çareseriyê jî lê dikem. Her weha ez dixwazim ji xelkê re diyarkem ku ji kevin da Kurd hûner zanin û em jî her dirêjîya rehên wanin.

Dîtina xelkê û raya rexnegira û hûnerwanan ji Iraqiya Kurd û Ereba çiyê li ser pêşangeha te yên çoyî?

Çavroniya xelkê bo min bi eqera serketina min ji 80-86 an de, ku min heft pêşangeh çêkirin. Ev wê diyar diket ku, karê min cihê razibûna xelqê bû, nexasim xelqê derveyê Iraqê. Gelek ji hunermendên bi nav û deng li Iraqê jî karê min razibûna.

Dema ku te karê xwe dikir, tu nexweşî û grêftari ji rejîma Iraqê didî?



Nezîr Xeylanî li ser karê xwe

foto; ANK

Nexweşiya ku, min ji dest rejîmê dîtî pir in. Ji wan dema ku min pêşangeha xwe ya çaran li Erbilê dana, serketinek pir mezin bû û gelek xelk hatin pêş, paşî daxwaz ji min hat kirin ku li Bexda jî danim û dema ku pêşangeh gihişt Bexda, li vir qedexa kirin.

Tu çawa li rewşa hunerwanên Kurd li Iraqê dinêrî?

Ji wê rewşa ku ez teda diyar bû ku kesê ji bo gelê xwe û netewa xwe bixebite, tu riya wî nine ku ew li welatê xwe bişît. Ez dibêjim şermek pir mezin e ku hûnerzan jê girêdayî bit, ji ber ku hûner dema ku hat girêdan neşê rêtaze bit (pêşve bihere). Hûnerzanên Kurd teqat veşartî ye li nav gel da û Kurdistan bixwe wan wîzên veşartî li cem xelqê di teqînî û diyar diket. Birayê min yê ji min biçuk-tir dest bi tiraşîna dar û beran kiribû. Eger ez Ereba bama, ew dê min pir pêş xistibana, belê dema ku mirov hûnerwanek Kurd bit li Iraqê û mirov bi êş û janên gelê xwe hest neket ew ne hûnerwan, belkû ew mirovek xirabe. Ji ber vê yekê niha bêtir 200 helbestvan, nivîsvan û hunerzan li rezên CUD hene. Weke mamoste Kusrêt, ew e ku Kurdistanê hêlay piştî ku rejîma Iraqê karê wî yê hunerî li Suleymaniyê (Kawayê Hesinker) xirabkirî û biserêkda înay.

Çima tu gihiştî nav şoreşê û ji ber çi ku ji Iraqê rewiyayî?

Weke ku me bersiva pirsiyarêş an de ron kirî; Ji bo xizmeta bizava Kurdî em gihiştin rêza şoreşgerên Kurd da ku ez bi riya xwe ya hûnerî bikarim êş û zordariya li ser wan diyar kim û ji bo hemû cihanê saxlemiya hûnerê Kurdî ye ku hebûna Kurda dixit ber çawan.

Herweha hesta neteweyî li cem min gihişt, hindê ku min pal det nav rezên pêşmergên şoreşger û dîsan birayê min hûnerwan Beşîr Xeylanî ewê ku li gel min gihiştî nav şoreşê ji bo ku em herdu bi hev re karên hunerî bikin.

Paşî ku tu ketî rêza şoreşê, çi guhertin ketine naveroka karê te yê hunerî?

Piştî ku ez hatim nav şoreşê, karên min yê hunerî bûne traşînên ku xebata çekdarî ya gelê Kurd têxin berçav, piştî ku di berê da min gireftariyên komelî û çandî yên Kurdî û hest derbirînek kêm û gîreday; belê niha azad im ji bo derbirina êş û janên gelê xwe û karê min yê giring ew e ku bi hûnera xwe dengê şoreşê bigehinim durtirîn cihê li cihanê.

Piştî ku tu hatî nav şoreşê, çi gotinê te ji hunermendên kurd re heye?



Ez dixwazim ji hemî hûnerwanên Kurd çî li Kurdistanê yan ewên li derve, ku ew hemî bi karên xwe yê hunerî êş û janên gelê xwe bigihinên hemî cihanê û rewşa Kurdistanê ya pir bi kul û dok li bin sîbera rejîmî diktatorî û faşî bi karên hunerî derbibirin. Li demekî ku gelê Kurd gelek pêtîvî karên wan in.


Tu çi dixwazî ji raya giştî re bêjî bi rêka rojnama Kurdistan Press?

Ez dixwazim ji raya giştî re bêjim ku gelê Kurd li gel wan rewşên niha ku têda, ewan tiwanayîn mezin hene ji bo diyarkirina xwe û bizava rizgarîxwazê xwe ya ew e ku kiriye cihê metirsiya şoveniyên deverî. Belê ev gelê he jî berêda û heta niha weha diyar kiriye ku xwedî hûner û çandek magîlin...

Rojnama Kurdistan Press, ku li ser karên min wisa rawesta ewên ku di nêzik de li Ewropa yê nîşandan ewê diyar diket ku ew her dem rastiyên eşkera li ser gelê me belavbike û xebatê biket ji bo gi-handina dengê Kurdistan bo hemî gelên cihanê. Weca ez gelek spasîyên Kurdistan Press dikem ku ev çawpêketina (hevpeyvîna) azad li gel min kirî û dengê gelê min yê perçe perçe kirî digehînt hemî cihanê. Spas û hezar spas ji bo her qelemek ron ji bo xizmeta gelê Kurd...


Gündî û Bageraşvan • 3 • Der Bauer und der Windmüller

Xêz û nivîs; W. Busck-Vergerandin; R.I. Hulmanî



Der Müller aber mit Vergnügen
Sieht in der Luft den Esel fliegen.

Aşvan bi keyf û tirane,
Qaydikir, ker li asmane.



Indessen haut dem Bäuerlein
Ein Flügel an das rechte Bein.

Wî sebebî pervane datê
Lêdikeve qorlingê rastê.




Jetzt endlich bleibt die Mühle stehn,
Doch um den Esel ist's geschehn.

Andî, bageraş rawestî,
Tiştêk têt serê kera wî.


••••• We dom bike

BRUSK • 11 meh • Lübeck/Almanya •



Ew foto di Newroza 87 an de hatine girtin. Hi-widarim ku her dem Kurdistan Press xebatê xwe berdewambit.

Zelal • 9 sali / Norge



□ Ji JÎR re, silav û evînên me...

Em zarovên Kurd li Îsraîlê ji millet û welatê xwe dûr in. Rojekê teyrekî xerîb hatîbû gundê me, bi rastî keyfa me ecêb hat. Ew jî kurdekî ji kurdistanê rengîn. Me jê re stiran û govend pêşkeş kirin.

Dûmahîk, di xweşiyê de bimînin û her bijîn ji bo Kurd û Kurdistanê.

4 zarowên Kurd
Îsraîl, 1987

NIŞTIMAN • 8 sali • Stockholm •



TEKOŞIN • 9 sali • Stockholm •



Tekosin AKMAN

9 salimo

Ala Kurdistan

snifa 1b

BO "HEVNASÎ", YEKÎTÎ Û PÊŞKETINÊ !!

Gelî xwendevanên hêja, we-ku em tev dizanin derd, kul û dijminên me kurdan pir in. Ji bona wê yekê, yekîtiya me û "hevnasiya" me pir girîng e. Li welatên xerîb, dûrê axa xwe, xwedî dost û hevalên xwe divê em bêhtir li ser vê yekê bisekinin, nêzî hev bibin û hevdu nasbikin.

Roj bi roj, mihacîrên kurda zêde dibin û gelek zarokên kurda li welatên xerîb tene dinê. Ev zarok di nava civateke xerîb de dijîn û mezîn dibin. Wextê ku du an sê zarokên kurda digihin hev, bi zimanê xerîb bi hev re xeber didin (qise dikin), wek swêdî, elmanî û tirkî.

Ew zarok qala mesele, çîrok û stranên xerîb dikin. Merow ji xwe pirs dike, gelo çima wa ye?

Ê ku li ser vê yekê çêtir û bêhtir dizanin hene, lê bi dîtina min çend ji wan tiştan ev in; jiyana di nava civateke xerîb de pir zor e, li mal û li der du kulturên (çandên), cê cê dibînin, dibistan û zarokgeh (daghem) zarokan asimîle dike, televîzyon û video zarokan û civata wan î malê ji hev dûr dike, têkiliyên wan bêje qut dibin. Ji bona ku ev "problem" wînda bibin an kêm bibin, merow kare pir tiştan bike; Li gelek ciya komikên folklorî, muzîkê, sporê

çêbûne û di wan komikan de pêşve çûnên pir mezin çêbûne. Zarokên kurda hev dibînin, hev nasdikin, bi hev re bi kurdî xeber didin û wextekî (demekî) xweş bi hev re derbas dikin. Xerîbiya xwe ji bo demekî jîbîr dikin.

Tiştêkî ku merow kare baştir bike û bi pêşve bibe spor e. Herkes, li hemû derê dinê dibêjin spor ji bo xweşiya canê insan baş e, lê gelek ji dê û bavên zarokê kurda dibên na! Gelo çima dibên na?

Bi dîtina min tîrsa wan ew e ku zarokên wan guh nedin xwendina xwe. Heqê wan heye, dê û bav hertim xweşî û serketina zarokên xwe dixwazin û wekî din jî em kurd miletekî bindest û negihaştî ne, insanên zane ji me pêwîst in. Îmkanên welatê Ewropa pirin, merow kare bibe zanekî mezîn û ji miletê xwe re xebateke pir girîng bike. Lê gerek em jîbîr nekin ku li welatekî xerîb wek Swêd tenê bi çûna dibistanê û hatina malê li ser nakeve. İnsan wilo bi kemayî dimîne û dijî. Ji aciziya, diçin digihin komikên neqenc xirabiya dikin, an jî wextê xwe li ber televîzyon û video derbas dikin. Ew merow sist û nexweş dibin. Spor, ji heftê çend seeta tiştêkî gelek baş e. Bi sporê merow derva dibîne, fikra merow xurtir dibe û me-

row bêhtir tiştan meraq dike.

Ji bona ku spor bi şiklekî baş û xweş bête kirin, divê ku dê û bavê zarokan alîkariya wan bikin, dilê wan xweş bikin, car carna bi wan re herin û binêrin, hevalên wan û spora wan nasbikin. Bi vî awayî insanên baş, jîr û zane dertên, nava dê-bav û zarokan xweştir dibe û nêzî hev dibin.

Çend taximên futbolê ê kurda sazûne, xortên kurd î bok-sor, gureşçî, qeretcî, ê ku pîn-ponê dilîzin, basketê dilîzin hene, ji bo ku ew pêşkevin û biserkevin alîkariya tev kurda pêwîst e. Çawa em kêfxweş û serbilind dibin wextê em navê kurd di radyo an di televîzyonê de dibihîzin? Tiştêkî bê gotin e!

Erê em bê welat in û bindest in, lê gerek rê li zarokên kurda neyê girtin, berê ew jî weke zarokên din jîr bin. Herkes nikare bibe textor û mihendis, tiştê bê dil nexweş e. Bere êdî mûzîsyân, sporvan jî ji kurda derên û serê me bi wan bilind be. Ew jî aliyek ji pêşveçûna me ye. Bere êdî spor jî di rojnamên me de cih bigre, derd û kulên me kurda bi nexweşî rihet nabin.

Cehwer BATTÊ

18.5.87
UPPSALA—SWÊD



Xemê, ji Somalê • foto; Beşîr Botanî

Bo nimûne min Kurdekî Efxanistanî dîtîye û bi Kurdiyêke nî Botanî dipeyivî... Cigerxwîn Qenatê Kurdo dîtîye... Kurdekî Îsraîlî li Emêrikayê û li nexweşxanekê serok Barzanî dibîne... Çend Kurdên Tirkiyê bifelestîtiyan re tene Îsraîlê ji bo şerî, bi destê serbazên Kurdên Îsraîlê tene kuştin û ên din tene girtin, (mixabin e)... polîsekî Kurde Îsraîlê dî Kurdeyê Tirkiyê li zindanê Îsraîlî dibîne... Beşîr Botanî hunermendekî Kurde xeresanê dibîne û navê wî Necmeldînê xeresanî, Kurdeke Efrîkayê dibîne û navê wê xemê û t.d. Li dawiyê karekî baş e ger em feyde ji hevdu bibînin dema ku em dicivin û xwe bikin yek û hemî ji bo Kurd û Kurdistanê û folklorê dewlemend a ku dem bi dem wînda dibe...

Êdî her bijîn ji zimanê Kurdî...

S.Diyarbekirî / Îsraîl

Divê em xwe bi Kurd bijmêrin...

Berî her tiştî divê em miletê xwe ji bîr nekin, angore em Kurd in û bile dîtina me an ola me cuda bin û t.d.

Eger em li dîroka Kurdistanê binêrin dibînin ku gelek caran Kurd ji Kurdistanê hatine derxistin... Ew jî ne ji ber bîr û baweriyên wan bû, lê belê ji ber ku ew Kurd bûn...

Îroj gelek Kurd li dervê Kurdistanê hene, çî li Afrîka, Pakistan, Libnan an çî li Îsraîlê û t.d. lê cihê mixabinê ye ku ew hemî belav in. Ew jî ji ber ol û dîtînê wan ên cuda... Çi misliman an çî sosyalîst bin û t.d. Îdî di vê rewşê da doza Kurdî wînda dibe... Baştir e ger em

Çok Değerli "Kurdistan Press" yayıncıları

Gazetenizde, geçmişte burjuvazinin tarihte ört-bas ettiği, kitlelerin gözünden kaçırıldığı olayları yazıyorsunuz. Türkiye ve Türkiye Kürdistanı'nda tüm Kürdistan'daki ulusları, azınlık ve milliyetleri gazetenizde geniş olarak tanıtıyorsunuz. Bunun yanında geniş bir kitleye kültür, ideoloji götürüyorsunuz, haber yayınlıyorsunuz, bu çalışmalar çok iyi ve yararlı çalışmalardır. Sizlere başarılar dilerim.


Ben bir Süryani çocuğuyum. Ben ve ailem, uzun yıllardan beri hakim sınıfların asimilasyon politikası, dini ve milli baskılarıyla kendi

kimliğimize yabancılaştırdık. Benim gibi, Kürt ulusu, Süryaniler, Ermeniler, Keldaniler, Yezidiler ve bir çok uluslar ve milli azınlıklar da aynı baskılar altındadır. Başka bir olumsuz durum da, kendi yaşadığımız ülke içindeki, ezilen sınıftan insanların da bizleri tanınamaması...

Sizden bir isteğim olacak: bana IDSUB ya da Süryani Konfederasyonunun adresini yazar mısınız? Kendi kültürümü geliştirmek istiyorum.

Sizlerin azınlık milliyetlerle ilgili yayınlarınızı olumlu bir çalışma olarak değerlendiriyorum. Devrimci selamlar.

M. ALTAY • 15. Mayıs.1987 / Danimarka



Av. Alparslan YAMAN

(1950 — 1987)

Me têkoşer û dilovanekî Kurdistanê Avukat Alparslan YAMAN bi tevî bermaliya wî û lawê wî, di qezakî trafikê, roja 25 Gulanê 1987 an de windakir.

Emê wan hertim bi bîrbînin.

HEVALÊN WÎ

KURDISTAN PRESS
rojnameya 15 rojîn □ 15 gûnlûk gazete

Kurdîsk Tidning
Utkommer varannan vecka
Nummer; 19/11
3 Puşper • Haziran 1987

Chefredaktör och ansvarig utgivare
Orhan KOTAN, 08-295056
Redaktion sekreterare
Çetin ÇEKO, 08-298332
Teknik sekreterare
S. SERDAR, 08-984743
Administration-Prenumaration
B. AZAD, 08-298332

Postadress; Box 7080, 17207 Sundbyberg
Besökadress; Örsvängen 6C, Hallonbergen
Tlf; [46] 8-29 83 32
Telex; 131 42 ANK S
Bankgiro; 343-5559
Postgiro; 2 65 33-0

Tryckeri; Idrottsbladet / Södertälje

Dear Editor:

□ I have been following your newspaper through my Kurdish friends for awhile now. Thank you for providing the knowledge and information concerning Kurdistan, and the aggression on its people, to the Kurds and their friends in and out of Kurdistan.

With the situation of Kurdistan and the inconvenience caused by its hypocrite, tyrant enemies, as an artist I have enjoyed every opportunity to serve along with my friends in the Kurdistan Fine Arts Society in America (KFAS), example of this is a projekt for the UNCFIF international contents that I did, along with my musician friend, the organizer of the KFAS Mr. Hunar Bekhtyar back in 1986, under the title KURDISTAN and we dedicated it to the Kurdish children all over the world.

(...)
My letter acknowledged your interview with "ŞİRİN" under the title "Hunermenden Kurd li Awropa" page 13 of September 1986 issue I was distressed to read statements attributed to ŞİRİN that could only be detrimental to our cause.

First of all the statement affiliating our movement with that of the communist party, is not only misleading to your readers, but absolutely false. We are not now, nor have we ever been associated with the communist party in any form or fashion, while not throwing stones at any party or system in particular, we are proud to proclaim our democratic convictions. Also, Şirin herself had virtually nothing to do with this projekt, other than reciting a brief narration toward the middle of the song as written by Hunar Bekhtyar, the co-writer.

Again we are very proud of the work being done by your press, but we also feel that it is of the utmost importance that the record be set straight. Indeed, quotes attributed to Şirin or any one else in your fine paper should be verified and documented before being set to print in the event of a misquote or misrepresentation.

... As soon as possibly and/or write a complete explanation in your press, detailing above information.

Your cooperation is appreciated and expected.

Sincerely,

Danny TATE
U.S.A

ABONE

6 MEHÎ • 6 AYLIK SALEK • YILLIK

Tarih / Dîrok.....

NAV-PASNAV
ISIM-SOYISIM

NAVNİŞAN
ADRES

WELAT-ÛLKE

240	Skr
240	FF
60	DM
72	G
1440	BF
60	Sfr
24	£
35	\$
2880	D
480	S

Hûn dikarin heqê aboneti li ser hesaba GILALA AB Postgiro 26533-0 Stockholm razinin û sûretet jê ji Box 7080, 172 07 Sundbyberg-Sweden re bi qarta abone rêkin.

Abone ücretini GILALA AB PG; 26533-0 Stockholm kontosuna yatırarak, bir kopyasını Box 7080,172 07 Sundbyberg-Sweden adresine abone kartıyla birlikte postalayarak abone olunabilir.

KURDISTAN PRESS

ROJNAMEYA 15 ROJÎN • 15 GÜNLÜK GAZETE

HEJMAR • SAYI 19/II 3 PUŞPER • HAZİRAN 1987 ISSN 0283-4898

ALMANYA • 2.5 DM
HOLLANDA • 3 G
SKANDİNAVİEN • 10 SK
FRANSA • 10 FF
İSVİÇRE • 2.5 Sfr
AMERİKA • 1.5 \$
AVUSTURALYA • 1.5 \$
İNGİLTERE • 1 £

Büro ; Örsvängen 6C, 172 42 Sundbyberg • Yazışma adresi / Navnışan : Box 70 80, 172 07 Sundbyberg-Sweden • Tlf. (46) 08-29 83 32 • Tx. 131 42 ANK S

LÜBNAN

BAŞBAKAN ÖLDÜRÜLDÜ!


(Reuter•ANK)

Lübnan Başbakanı Raşid Karami, 1 Haziran sabahı uğradığı bir saldırı sonucu öldürüldü. Helikopterle yazlık evinden başkente yol alırken, Beyrut'a 25 km. kala koltuğunun altına yerleştirilen bombanın patlaması sonucu ölen Karami, 1958 yılından bu yana on değişik hükümete başbakanlık yapmıştı.

Raşid Karami ile birlikte aynı helikopterde bulunan İçişleri Bakanı Abdullah Rassi ise patlamadan yaralı olarak kurtuldu.

Lübnan'ın en eski politikacılarından olan Karami, 4 Mayıs'ta Devlet Başkanı Cemayel'e, kurmuş olduğu 10. hükümetten istifa dilekçesini sunmuştu. Ancak Cemayel, Karami'nin bu talebini kabul etmeyerek görevde kalması emirini vermişti. Devlet Başkanı Emin Cemayel, Karami'nin öldürülmesinden bir gün sonra Başbakanlığa hükümetin Eğitim Bakanı 57 yaşındaki Selim Hos'u getirdi.

Bu arada Karami'nin öldürme eylemini, Lübnan Gizli Ordusu ile İslam Şehitleri İntikam Tugayları adlı örgütler üstlendiler. Siyasi gözlemciler Raşid Karami'yi Lübnan'da çeşitli gruplar arasında denegeyi sağlayan ender politikacılardan biri olarak değerlendiriyorlar. Raşid Karami'yi şii lider Nebih Beri ve Dürzi lider Velid Canpolat'ın tersine kendisini destekleyen bir milis gücü yoktu.



Başbakan Raşid Karami foto; Reuter

İSVEÇ

G. Andersson göçmenler arasında!



Göçmenler Bakanı polisin müdahalesi sırasında zor anlar yaşadı.

foto; U. Karlsson

Stockholm•ANK

İsveç'te son günlerde faaliyetlerini yoğunlaştıran, ırkçı İsveç Partisi, geçtiğimiz günlerde yeni bir gösteri eylemini, Stockholm'ün Sergelstorg meydanında yaptı. 30 yakın gösterici, göçmen düşmanlığı içeren bildiriler dağıtırken, aynı esnada sayıları 200'e varan anti-rasist örgüt üyeleri eylem kırmak amacıyla alana geldi.

Saat 11 sıralarında, İsveç Göçmenler Bakanı Georg Andersson, son günlerde faaliyetlerin artıran ırkçı gruplarla ilişki kurmak ve olayı yerinde izlemek amacıyla miting alanına geldi ve hem ırkçı ve hemde anti-ırkçı örgüt üyelerinin sorumluları ile birer görüşme yaptı.

G. Andersson Afton Bladet gazetesine verdiği demeçte; "...halkın arasına karışıp, onlarla görüşerek ırkçılı-

ğın yayılmasını önleyebileceğimizi sanıyorum" dedi. Aynı saatlerde her iki grupta görüşmesini tamamlayan Andersson, kafeteryada koruma polisleri ile kahve içerken iki grup arasında kavga meydana geldi. Tekrar grupların yanına dönen bakan olayı şöyle anlattı; "Daha önce sakın bir şekilde görüştüğüm insanlar birbirlerine kaba küfürlerle hücum ediyor, yumurta atıyorlardı. Olayın büyümesini önleyebilmek amacıyla onlarla konuşmaya çalıştım, fakat olay durmadı, polisin müdahalesi gerekti." dedi.

Atlı polisler eylemi dağıtmak amacıyla göstericilere yöneltilerinde sırada, G. Andersson'da kalabalığın içinde bulunuyordu. Polis dakikalar sonra bakanın alanda bulunduğunu farketmesi üzerine eylemini durdurdu. Olay sonrası her iki gruptan da kimse tutuklanmadı.

İsmail Beşikçi tahliye oldu!



□ Kürdistan'ın sosyo-ekonomik yapısı üzerine yaptığı araştırmalar nedeni ile 1960'lı yıllardan bu yana sürekli olarak devlet terörünün hedefi haline gelen sosyolog İsmail Beşikçi, 25 Mayıs 1987 günü yattığı Antep E Tipi kapalı Cezaevi'nden tahliye edildi.

□ Dünyanın en çok acı çeken yazarlarından biri olarak kabul edilen ve Dünya Yazarlar Birliği (Penn) şeref üyesi olan Beşikçi'ye 1971'den bu yana verilen cezaların toplamı 30 yılı buluyor. Türkiye'de yayımlanan kitapları da kimi mahkeme kararı, kimi keyfi uygulamalarla yasaklanan Beşikçi, en son İsveç Yazarlar Birliği Başkanı'na yazdığı bir mektuptan ötürü 10 yıl hapis cezasına çarptırılmıştı.

Hapisane çıkışında basın mensupları, avukatları ve öğrencileri tarafından karşılanan Beşikçi, "Türk basını ve aydınları her zaman devletin yanında yer almışlardır" dedi. Beşikçi, Bulgaristan olayları ile ilgili olarak da, "Türk devleti Bulgaristan'da Türklere yapılan baskıları kırkarken, Kürt halkı üzerindeki baskıları görmezden gelmektedir. Diyarbakir'de hapsedilen yüzlerce insana işkence yapılmış, bir kısmı ölmüştür. Halen, tutuklular çok zor şartlar altında yaşamaktadırlar" dedi.

TRAFİK KAZASI GEÇİREN

Av. Alpaslan Yaman ve ailesi öldü

Muş • Özel

□ Bir mahkeme dönüşü, Erciş'ten Malazgirt'e dönen Avukat Alpaslan Yaman, yanında bulunan eşi ve çocukları ile beraber geçirdiği trafik kazasında vefat etti, (25 Mayıs 1987).

Alpaslan, 1950 yılında Malazgirt'te doğmuş, Ankara Hukuk Fakültesini bitirdikten sonra, doğduğu ilçede avukatlığa başlamıştı.

12 Eylül darbesinden sonra bir kaç kez gözaltına alınmış, işkenceden geçirilmişti. 1981'de ise ve 18 ay Elazığ Cezaevinde yatmış ve 10 yıl cezaya çarptırılmıştı.

Alpaslan Yaman'ın bu ani ölümü, devrimci çevrede derin üzüntü yarattı.

AIDS VİRÜSÜNÜ PENTAGON YAYDI!

ABD Başkanı Ronald Reagan'ın ülkeye gelecek tüm mültecilerin, hapisanelerde mahkumların ve hastahanelerde tedavi gören hastaların AIDS'li olup olmadıkları konusunda tahlillerinin alınacağını açıklamasından sonra, Batı Berlin Genel Biyoloji Enstitüsü eski yöneticisi Jakob Segal'ın yaptığı açıklama ilgi uyandırdı.

Segal, bundan bir süre önce yaptığı açıklamada AIDS virüsünün, ABD'nin Maryland eyaletindeki Fort Detrick'teki 550 nolu binasının P-4 laboratuvarında hazırlanıp dünyaya yayıldığını iddia etmişti. Bu laboratuvar, uzaydan gelebilecek herhangi bir hastalık mikrobuna karşı en üst düzeyde güvenliği sağlamak amacıyla kurulmuş ve 1977 yılında 1 milyar dolar harcanarak P-4 laboratuvarı olarak açılmıştı.

P-4 laboratuvarında bulaşıcı hastalıklar üzerinde araştırma yapılmasının Pentagon'un ilgisini çektiğini açıklayan Segal, virüslerin ve hastalık yapan mikropların insanlar üzerinde etkisini inceleyen araştırmaların çok kez gönüllüler, özellikle idam mahkumları üzerinde denendiğini açıkladı. Bunlara deney sonrası özgürlüklerine kavuşacakları söyleniyordu. Bu nedenle her zaman kobay olarak kullanılmayı kabul eden mahkumlar bulunabiliyordu. Segal bu mahkumların önceleri yalnızca hafif rahatsızlık geçirdiğini, fakat sonra sağlığına kavuşmuş görüldüğünü ve aylarca hiçbir belirti görülmediği için salıverildiklerini de vurguladı. Segal, salıverilen kobayların daha sonra bu virüsü topluma yaydıklarını iddia etti.